"Erməni və Assuri ordusu Urmiya şəhərini asanca ələ keçirdi. Mar Şəmun bir qrup assuri və erməni ilə birlikdə Səlməsa doğru hərəkət etdi. Mar Şəmun İsmayıl ağanı yanıltmaq istəyirdi. İsmayıl ağaya xəbər göndərərək onunla bir yerdə görüşmələrini arzu etdiyini bildirdi. 1918-ci ilin fevral ayında Konəşarda görüşməyi qərara aldılar.

Mar Şəmun yanına silahlı 140 süvari və seçkin adamlar alaraq bir faytona minir və şərtləşdikləri gündə görüş yeri olan Konəşara gəldi".

Tədqimatçı və tarixçi yazar Ələddin Secadi "Kürd inqilabları(başqaldırılarındadır)" kitabında göstərir ki, çar Rusiyası, bu ölkədə bolşeviklərə qarşı əngəllər etmək istəyirdi. Bunun üçün üsyanlar ölkəsi olan Kürdüstanın bu bölgəsində yaşayan kürdlərin, ələlxüsus İsmayıl ağanın səsini söndürmək fikrindəydilər. Ruslar Mar Şəmunla danışıqlar apararaq bir anlaşma əldə etdilər: "Bu məmləkətdə İsmayıl ağa var. O, həm çarın, həm də Mar Şəmunun önündə bir əngəldir dedilər. Başlanğıcda kürdlərlə ermənilərin birlikdə bir hökumət qurmalarını əldə etmək məqsədilə Simko ağa ilə görüşmələr etdilər. Ancaq həqiqətdə Simkonu və kürdləri aradan çıxaraq doğrudan doğruya bir erməni və assuri dövləti qurmaq istəyirdilər".

Bu həqiqətə çox bənzəyirdi. Çünki, yuxarıda qeyd etdiyimiz kimi Mar Şəmunun təlimli 25 min silahlısı var idi. Bunlar əsgəri ordunun komandası altında idi. Arxasında ingilislər və Rus çarının hər cür dəstəyi vardı.

### I Dünya Müharibəsinin sonunda ölkədə olan şərait və durum

İsmayıl ağanın qüvvələri isə nə o dərəcədə təlimli, nə də disiplinə sahib idi. Təməldə əsirət qüvvələri birliyi idi. Ayrıca, ona arxa çıxıb silah və cəbhəxana baxımından yardım verən hər hansı bir dövlət də yox idi. Belə olunca Simkonun ortadan qaldırılması ermənilər üçün bir içim su kimi asan olacaqdı.

İsmayıl ağa Simko yaxşı bilirdi ki,

erməni və assurilər Türkiyədə kürd bəy və ağalarını bir yere yığaraq güya kürd dövləti qurmaq planlarını hazırlayırmışlar. Lakin, qəfildən xain ermənilər kürd bəylərini atəşə tutub hamısını güllələyirlər. Ancaq onlardan biri bayırda olduğu üçün atına minib xalqı xəbərdar edir. Beləliklə kürdlər Türkiyədə ermənilərin kökünü kəsir. Əslində isə ermənilər kürd bəy və ağalarını öldürərək, onların türklər tərəfindən qətl edildiyini yayaraq, onsuz da aralarında olan münaqişəni qızıdıraraq iki müsəlmanı bir-birinə qarşı saldıraraq qırdırmaq istəyirdilər. Bu məsələləri yaxşı bilən İsmayıl ağa Simko hər addımını ölçüb-biçib, düşünülmüş şəkildə atırdı. Necə deyərlər, suyu üfləy-üfləy içirdi.

Hətta, bir dəfə Simkonun siyasətindən baş açma bilməyən bir kürd bəyi Simkoya qarşı çıxır. Onu başa düşən Simko ona deyir: "Mən səni yaxşı başa düşürəm, narahat olma. Ata-babalarımızın qanı ilə suvarılmış bu müqəddəs torpaqların üstündə nəinki erməni dövlətinin qurulmasını, heç onların ayaq basmalarını da istəmirəm. Səbrli ol, nəticəni görəcəksən".

İsmayıl ağa Simko ilə Mar Şəmun arasında keçən görüşmələr haqqında tarixçi və tədqiqatçı Ələddin Səcadi bunları yazır:

"İsmayıl ağa Mar Şəmunu padşahlar üçün hazırlanan rəsmi qayda ilə qarşılayır. Mar Şəmun dini liderlərin geydiklərə allı-şallı geyimlər içində gələcəkdə bir xalqın rəhbəri olacaq adam kimi, çevrə mühafizələri ilə zərli dörd atlı bir faytona minərək, dördü rus olan və faytonda oturmuş vəziyyətdə üzləri qarşıya və yana baxan atlı yüksək rütbəli əsgərin ikisi Mar Şəmunun arxasında ayaq üstə gözləyirdi. Qılnc dəstəklərinə zümrüd və dəyərli mücəvhərlərlə bəzədilmiş qılınclarını qınından çəkib əllərində tutmuşdular. Bu görkəm padşahlara yaraşan bir görkəm idi. Günəş şüaları düşəndə insan heyrət içində qalırdı. Mar Şəmun bu biçimdə Teymur ağanın qonaq evinə endi".

Mar Şəmun görüş yerinə çatan vaxt İsmayıl Ağaya arxasında bir sıra adamlar Konəşara gəldilər. Ancaq İsmayıl ağa daha qabaqcadan öz adamlarını Teymur ağanın imarətinə göndərmiş və evin əhatəsində özlərinə uyğun mövqə tutmuşlar.

Mar Şəmun oraya çatınca özü otağa keçib oturur və atlıları tam hazır bir vəziyyətdə eşikdə gözləyirdilər. Kəsrəvi bu haqda belə yazır:

"Bizim Mar Şəmun və Simko görüşməsindən xəbərimiz yox idi. İsmayıl ağanın hadisə haqqında özünün söylədiyinə görə, Mar Şəmun "İndi Kürdüstan deyə adlandırılan bu ölkə bizim, bizim vətənimizmiş. Nə var ki, din Aləmi qarşı-qarşıya bizi bölmüş. İndi birləşməmiş gərəkdir. Ölkəmizi ələ keçirib birlikdə yaşamaalıyıq. Ordumuz birləşdirsək siz də bizimlə olur-

sanız TƏBRİZİ almaq bizim üçün çox asan olar". Çünki şimalda da rusların köməyi ilə Şaumyan və Mikoyanın rəhbərliyi altında Xəzərdən Qara dənizə, Diyarbəkirdən İran körfəzinə kimi bir federativ dövlət yaradacağıq.

Simko Mar Şəmunun planını öyrəndikdən sonra gülümsəyərək ona "düşünərəm" - dedi. Mar Şəmunu yola salmaq üçün onunla birlikdə bayıra çıxır. Mar Şəmun faytona minən zaman silah səsi eşidilir. **Bu səs istər Kürdüstanı, istərsə də Azərbaycanda ingilis rus havadarları olan erməni,**



Assuri lideri Mar Şəmun

**assuri qırğınlarından qurtarır və ermənilərin dənizdən dənizə xülyasını alt üst edərək Lozanadakı erməni plankeşlərin planını alt-üst edir.** Mar Şəmun yerə yıxılır. Şikəti silahlı gücləri dörd bir yandan Tıqranın və Mar Şəmunun atlı silahlılarına atəş açır və 100-ə qədər seçmə adamlarını öldürürlər. İsmayıl ağa həmin gün Çariyə dönr. Ertəsi gün sübh tezdən assur və erməni orduları İsmayıl ağaya qarşı hücum keçirlər. Ətraf kəndlərin əhalisini qətl edərək heç kimə aman vermirlər. İsmayıl ağa çətin bir qarşıdurmadan sonra Çariya şəhərindən çıxmaq məcburiyyətində qalır.

Mar Şəmunun öldürülməsindən sonra xalq, xüsusilə Səlməsa və Urmiya ətrafındakı əhali erməni və assurilərin qanlı qırğınlarına hədəf oldu, çoxlu insan öldürüldü. Mar Şəmunla danışıqlara gedən zaman İsmayıl ağa Simko Osmanlılardan və Təbrizdən yardım istəmişdi. Və o xəbərdar etmişdir ki, 25-000 nizami orduya qarşı vuruşar lakin bu bir çox əhalinin kütləvi qırğınına səbəb ola bilər. İsmayıl ağa Simkodan gözü qorxan şah imkan vermirdi ki, Azərbaycanda bir erkək quş da uçuşsun. Odu ki, Azərbaycandan heç bir yardım gəlmədi. Bir tərəfdən isə İran şahı o ərazilərdə bir erməni və assuri dövlətinin yaranmasının tərəfdarı idi. Ona görə erməni və assurilərə ingilislərin vasitəsilə yardım edirdi.

Amma İsmayıl ağa Simko kürdlərdən ibarət silahlı dəstənin Türkiyədən yardım gəlməyinə inanırdı. Türkiyədən gələn əsirət qüvvələri və eləcə də İraq

Kürdüstanından Şeyx Mahmud Bərzənci qüvvələri gec də olsa köməyə gəldi, erməni və assuri ordularına ağır zərbələr vuraraq məğlubiyyətə uğratdılar. Ermənilər ingilis ordusuna sığınmaq üçün Sayınqəlaya çəkildilər. Mukriyani kürdləri arasında bu il "Çilo ili" olaraq adlandırıldı. Mar Şəmunun öldürülməsindən sonra Rzayidə yaşayan (Urmiya) tarixi yazıçı və tədqiqatçı Əli Dehqaninin dediyinə görə ermənilər və assurilər 109 gün Urmiya bölgəsində qətliaamlar etdilər. Uşaq, qadın, kişi demədən 140 min adamı öldürdülər. Kənd və qəsəbələri talan etdilər.

Yaxşı, Simko heç bir səbəbi olmadan nə məqsədlə Mar Şəmunu öldürdü? Bu haqda müxtəlif fikirlər var. Bəzi tədqiqatçılar Simkonun bu hərəkətini böyük səhv olaraq qiymətləndirdilər. Ancaq bir qism sənədlərə görə Simko Rusiya və İngiltərənin dəstəyi ilə Mar Şəmunun belə böyük bir qüvvə ilə Kürdüstanın bu bölgəsində dövlət quracağına inanmışdır. Xüsusilə M.Şəmunun öldürülməsindən sonra liderliyə gətirilən Petros, Lozan konfransında Kürdüstanda assurilər üçün bir yerin təyin edilməsini istəyirdilər. Tipik Fələstində yəhudilərə yaradıldığı İsrail dövləti kimi. Və ya Leninlə Atatürkün razılaşması ilə Araz boyu qədim Azərbaycan torpaqlarının İqdir, Ərzurum, Ağrı, Amasiya, Vana qədər yəni Araz Azərbaycan Cumhuriyyətinin bir hissəsinin Türkiyəyə verilməsinə qarşılıq Türkiyədən qovulmuş və qədim Azərbaycan torpaqlarında yeni qondarma Ermənistan respublikasının yaranması üçün şərait yaratdı və Musavat hökumətini bolşeviklərə təslim etdi.

İrənin adlı-sanlı yazarı və şairi Məliküm-Şüarayı Bahar "Siyasal Partilərin qısa tarixi" adlı kitabında belə yazır:

"Lozan" konfransında erməni Petros Londonun dəstəyi ilə assur və kəldanilərin ən köhnə millətlərindən olduqları, yurdlarının isə Mosuldan Osmanlı Kürdüstanından və İran Kürdüstanından Urmiyaya qədər olan ərazini onlara verilməsini, ayrıca özləri üçün bəziri bir mərkəz və iqamətgahın verilməsini tələb edirdilər. Bununla birlikdə assurların İngiltərə və Rusiya üçün müxtəlif xidmətlər etdiklərinə və edəcəklərinə söz verirdilər. Türklərin yürütdükləri çabaların Mar Şəmunun öldürülməsində uzaq bir fikir yoxdur. Hər necə olursa-olsun Simkonun bu planı İngiltərə və Rusiyanın Kürdüstanda və Cənubi Azərbaycanda bir assur - erməni dövləti qurmaq planını pozmuşdur. Cilo məsələsinin yatırılmasından sonra 1919 -cu ilin yazında Simko bölgədəki gücünü artırmaq məqsədilə planlarını hazırladı. Təbriz Urmiya yolunu öz himayəsi altına aldı. 1919-cu ilin sonlarında Sipahandari Azam Azərbaycana vali təyin edildi. Sipahsalar Ziyad Devlə adında birini Urmiya hakimi olaraq göndərmişdir. O, Simkoya qarşı dirənməyə və öz müdafiəsini əldə etməyə çalışdı.

**Araşdırdı: Tahir SÜLEYMAN**



## Ji Serokatiya Azerbaycanê daxuyaniya civîna Nêçîrvan Barzanî û Aliyev



Serokatiya Komara Azerbaycanê li ser civîna îro 18ê Tîrmehê ya Serokê Azerbaycanê İlham Aliyev û Serokê Herêma Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî daxuyaniyek belav kir.

Di daxuyaniyê de hate gotin, di hevdîtîne de İlham Aliyev ji Nêçîrvan Barzanî re gotiye, "Ev serdan dê hemahengiya di navbera her du aliyan de zêde bike."

Serokatiya Azerbaycanê ragihand ku di civînê li ser çend mijarên têkildarî herdu aliyan hatine gotûbêj kirin û naveroka hevdîtîne wiha hate eşkere kirin: "Di hevdîtîne de berfirehkirina peywendiyên aborî û bazirganî yên Herêma Kurdistanê Iraqê û Azerbaycanê, veberhênana di warê enerjîyê de, zêdekirina geştîyariyê û vekirina geştên asmanî hatin gotûbêj kirin."

Aliyev berî destpêkirina civînê jî ji Nêçîrvan Barzanî re got: "Bîranînen min ên gelek baş ji hevdîtîna me ya li Munchenê hene" û Nêçîrvan Barzanî jî jê re got: "Gelek spas ji bo vexwendina min. Ez gelek kêfxweş im ku di dawiyê de hatim vir."

Hêjayî gotinê ye, ev Serdana Nêçîrvan Barzanî ya Azerbaycanê piştî hevdîtîna ligel Aliyev a Sibata îsal di dema Konferansa Ewlekariyê

ya Munchenê de pêk hat ku Nêçîrvan Barzanî bi fermî bo Azerbaycanê hatibû vexwendin.

Lêkolînerê Azerî: Serdana Nêçîrvan Barzanî pêngaveke cidî ye

Ji aliye din ve nivîskarê û lêkolînerê Azerî Agil Alesger derbarê serdana Serokê Herêma Kurdistanê ya bo Azerbaycanê de got: "Serdana birêz Nêçîrvan Barzanî di warê peywendiyên dualî de gaveke cidî ye. Heta niha têkiliyên her du aliyan di warê bazirganiyê de bûn, lê cara ewil e di asta rayedarên dewletê de têkilî pêş dikevin û projeyên navdewletî yên cidî hene."

Endamê Lijneya Rêvebir a Çapemeniyê ya Azerbaycanê û Serokê Koma Medyaya Serdema Nû Agil Alesger beşdarî bultena Rûdaw TV bû û têkiliyên Herêma Kurdistanê û Azerbaycanê û serdana Nêçîrvan Barzanî nirxand.

Agil Alesger bi bîr xist ku Serokê Herêma Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî û Serokomarê Azerbaycanê İlham Aliyev di 18ê Sibata de li Konferansa Asayîşê ya Munchenê û piştê jî di 4ê Hezîranê de li paytexta Tirkîyê bajarê Enqerê hevdîtîna kiribûn û got: "Ji bo vê serdanê beriya niha gelek gav hatibûn avêtin.

Di civînenê berê de wêneyên pir xweş hebûn. Di hat pêşbînîkirin ku hevdîtîneke bi vî rengî pêk were."

Alesger got: "Di navbera Kurdistanê Iraqê û Azerbaycanê de her tim pêwendiyek hebû. Ew jî xwedî paşaneyekê dîrokî ye. Di serdema Sovyetê de têkiliyên serokê damezrîner ê Azerbaycanê Heyder Aliyev bi Mela Mistefa Barzanî û serokên din ên Kurd re hebûn. Di van 20 salên dawî de ji ber hin sedeman ev têkilî hinekî qut bibûn, lê ji nû ve avakirina van peywendiyên ji bo her du welatan pir girîng e."


Agil Alesger amaje bi wê yekê kir ku Tirkmenên yek ji pêkhatiyên girîng ên Kurdistanê û Azerî ji heman binyatê tî û herwiha li Azerbaycanê jî Kurd dijî lewma jî têkiliyêke civakî di navbera wan de heye û wiha anî ziman: "Hezîrana di nava gelean de eger di nav dewletan de jî pêk were tişteke girîng e."

Bi gotina Alesger di vê çarçoveyê de ji bilî di warên aborî de encamên gelek baş ên serdana Nêçîrvan Barzanî hebin. Herî dawî Alesger, da zanî ku li Azerbaycanê ti cudahî di navbera Tirk, Kurd, Taliş û Lezgiyan de nîne û hemû welatîyên vî welatî ne.

rupelanu.com

## Serok Barzanî pêşwazî li şanda Partiya Komunîst a Iraqê kir

Serok Mesûd Barzanî pêşwaziya şandeke pilebilind a Partiya Komunîst a Iraqê kir.



Îro Pêncşema 20.7.2023 li Selaheddîn Serok Mesûd Barzanî pêşwaziya şandeke pilebilind a Partiya Komunîst a Iraqê ya bi Serokatiya Raed Fehmî Sekreterê Partiya Komunîst a Iraqê kir. Di hevdîtîne de di derbarê pêşhat û guhertinên dawî yên di nava proseya siyasî ya Iraqê guftûgo kirin.

KDP.info

## Daxuyaniyek ji Berdevkê Partiya Demokrat a Kurdistanê

Berdevkê Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK) di daxuyaniyê de êrîşkirin û şewitandina Balyozaneya Swêdê ya li Bexdayê şermezar kir û diyar kir ku ew di heman demê de şewitandina Qurana Pîroz şermezar dikin.



Berdevkê Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK) di daxuyaniyê de êrîşkirin û şewitandina Balyozaneya Swêdê ya li Bexdayê şermezar kir û diyar kir ku ew di heman demê de şewitandina Qurana Pîroz şermezar dikin.

Îro Pêncşemê 20ê Tîrmeha 2023an, Berdevkê Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK) Mehmûd Mihemed daxuyaniyek belav kir û tê de hatiye ragihandin: "Em bi navê Polîtîburoya Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK) êrîşkirin û şewitandina Balyozaneya welatê Swêdê ya li Bexdayê şermezar dikin û van reftaran li dijî destûr û yasa û rêsayên bavdewletî dibînin."

Berdevkê PDKê eşkere dîke: "Em di heman demê de şewitandina Qurana Pîroz şermezar dikin û em li dijî şewitandin û bîrîzkirina li pirtûkên pîroz ên hemû olan in û em piştîgiriya birêz Sûdanî û hikûmeta federal a Iraqê dikin ji bo pêkanîna rêkarên yasayî ji bo dubarenebûna van cûre kiryanan."

Nerina Azad

## Seferên balafirgehên Erbil û Silêmaniyê ji nûh de destpêkirin

Wezîrê gihandin û danûsitendin yê Herêma Kurdistanê Ano Cewher ragihand ku seferên her dû balafirgehên ji bo çend seetan hatibûn rawestandî, ji nûh de destpêkirin. Duhî êvarê seferên her dû balafirgehên ji bo çend seetan ji aliye Rêvebirîya Hewageriya Sîvîl ya Iraqê de hatibû rawestandî. Endamê komisyona gihandin û danûsitendin yê parlamentoya Iraqê Karwan Yarweys ragihand ku bi rêxistîna Iraqê ya Rêvebirîya Hewageriya Sîvîl û bi serokê rêxistîna Tûrîzma Hewagerî ya Iraqê re hevdîtîna kiriyê. Yarweys got ku: "Sedema rawestandina seferan ewe ku di seha hewayê ya Kurdistanê de balafirên bêmirov digerin û ji bo seferan bûne xeter. Wê sefer di nêz de normal bibin."

Piştî hevdîtîna li jorê, wezîrê Kurdistanê Ano Cewher daxuyaniya xwe da. Ji bo seferên kêmasî ketiye wan, wê bi şîrketên hewageriyê re bikevin nav têkiliyan û kêmasiya temam bikin.

Li terefê dinê peyamnêrê Rûdawê Rence Cemal ragihandîye ku sedema kêmasî ketiye seferan, tetbîqata hêzên koalîsyona navdewletîye.

PeyamaKurd

## Li dijî HUDA PARê êrîş: Kesek hat kuştin û yek birîndar bû

Ji aliye kes an jî kesên nasnameya wan ne diyar ve kesên ve li dijî Serokatiya Şaxê Edeneyê ya Partiya Doza Azad (HUDA PAR) êrîş hat kirin û di êrîşê de Sekreterê Bajêr ê Partiyê Sacît Pişgîn canê xwe ji dest da û Serokê Bajêr Salih Demîr jî birîndar bû.

Li gor daxuyaniya HUDA PARê ku li ser Twitterê hatiye belavkirin, li bajarê Edeneyê, Serokê Şaxê Edeneyê yê HUDA PARê Salih Demîr û sekreterê partiyê yê Edeneyê Sacît Pişgîn dema li avahiya partiyê nimêj dikirin rastî êrîşa bi kêran hatin. Sacît Pişgîn û Salih Demîr bo nexweşxaneyê hatine veguhestin lê tevî hemû hewlan Pişgîn ji mirinê rizgar nebûye. HUDA PAR dibêje: "Em êrîşkar û zalimên li pişt vî sûcî lanet dikin! Em hêvî dikin ku bûyer di zûtîrîn dem de bê ronîkirin." Cîgirê Serokê Giştî yê HUDA PARê: Em dê hesab bipirsîn Cîgirê Serokê Giştî yê HUDA PARê Halef Yılmaz li ser hesabê xwe yê medyaya civakî derbarê êrîşê de daxuyaniya da.

Halef Yılmaz dibêje: "Serokê me yê Edeneyê Salih Demîr û Sekreterê Parêzgeha me Sacît Pişgîn dema nimêj dikirin rastî êrîşa bi satiran hatin. Sekretera me Sacît şehîd bû û Serokê parêzgeha me jî birîndar bû. Em dê ji baronên tiryakê yên ku ev kar kirine hesab bipirsîn



û em dê dev ji meseleyê bemedin.

Ew ne bûyereke ne minferid e. Êrîşkar du kes in. Destên wan kesên qaşo bi siyasatmedar û rojnamegerên ku HUDA PARê kirin hedef jî bi xwîna me pîs bûn. Li Edeneyê trafîka tiryakê ya qirêj heye. Divê berpirsyarên vî karî bînin dîtî." Hat zanî ku ji êrîşkarên yek hat girtin û êrîşkarê din jî reviyaye. Polîs ji bo girtina êrîşkarê reviyayî dest bi xebatê kir.

Nerina Azad



## Nêçîrvan Barzanî: Gelê Kurdistanê ti caran piştgiriya Fransayê ji bîr nake

Serokê Herêma Kurdistanê û Fermandarê Giştî yê Hêzên Pêşmergeyên Kurdistanê ragihand

li dijî DAIŞê û şerê li dijî terorê û tundrewiyê kir, em her du alî li ser wê yekê hevfiqr bûn ku heta niha jî

bet e ji bo cîhanê, ji ber ku gelek pirsgrêkên emnî hene ku divê em rûbirûyê wan bibin. We niha ew şîrove kirin ku di civîna me de hati-bûn behskirin. Fransa di parlemantoyê de deng li ser biryarekê da ku berê tu caran hevşeweyê wê tunebûn, eger hevşeweyê wê hebûbe jî em dikarin behsa biryarên ku General De Gaulle di salên şêsttan de dan ji bo hêmkirina rewşên cuda li cihên krîzan nîşan bidin."

Sebastien Lecornu bal kişand ser belavbûna çekên atomî û anî ziman, "Tehtayên vegera rikaberiyê di navbera zilhêzan de, guhertinên keşûhewayê, tehtayên emnî li asman û deryayan û bê guman tehtayê mezîna ku ew jî tehtaya terorê ye. Ez dixwazim bibêjim ku Fransa peywendiyekê wê ya taybet bi vê herêmê re heye, peywendiyekê dostane û hestiyarî ye lê mixabin peywendiyekê tevî zehmetiyên e jî." Sebastien Lecornu her wiha diyar kir, "Bê guman ewlehiya Kurdistanê Iraqê ewlehiya welatîyên Fransayê ye jî.

Ev jî wateya vê serdana min e ku serdana dostaniyê ye, dilsozî ye, spasiyê ye ji bo karê ku heta niha hatiye kirin lê her wiha projeyên ji bo siberojê derbarê tehtayên ku tîna pêş me û dê hîn jî bîn pêş me û em dê rûbirûyê wan bibin."

**Nerina Azad**



ku "civîneke baş" bi Wezîrê Berevaniyê yê Fransayê re kiriye û got, "Gelê Kurdistanê ti caran piştgiriya Fransayê ya di qonaxên cuda de ji bîr nake." Serokê Herêma Kurdistanê û Fermandarê Giştî yê Hêzên Pêşmergeyên Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî îro Çarşemê 19ê Temûza 2023an bi Wezîrê Berevaniyê yê Fransayê Sebastien Lecornu re civiya. Piştî civînê Serokê Herêma Kurdistanê û Wezîrê Berevaniyê yê Fransayê civîneke hevbeş a rojnamevaniyê li dar xistin.

Nêçîrvan Barzanî anî ziman, "Me civîneke baş kir, me behsa şerê

DAIŞê metirsiyek e li ser ewlehî û aramiya Iraqê û navçeyê."

Nêçîrvan Barzanî tekezî li ser berdewamiya hevkarî û piştevaniya Hevpeymaniya Navdewletî û Fransayê ya ji bo Iraqê û Herêma Kurdistanê kir û anî ziman û got, "Ji ber berdewamiya piştgirî û dostaniya bi gelê Kurdistanê re, me spasiya Fransa kir. Gelê Kurdistanê ti caran piştgiriya Fransayê ya di qonaxên cuda de ji bîr nake."

Wezîrê Berevaniyê yê Fransayê Sebastien Lecornu jî ji bo pêşwaziyê spasiya Nêçîrvan Barzanî kir û got, "Ev demeke tay-

## Kurdên Kafkasyayê hewl didin çand û zimanê xwe biparêzin

Hejmareke mezîna ya Kurdên Kafkasyayê li Azerbaycanê dijîn. Ji ber şer û alozî û derfetên aboriyê jî, gelek Kurdên li Azerbaycanê li Bakuyê dijîn. Kurdên Bakuyê deriyên malên xwe ji tîma Kurdistan24'ê re vekirin û behsa serpêhatiyên xwe kirin. Kurdên Bakuyê hewl didin ku çand û zimanê xwe biparêzin. Ji Kurdên Bakuyê, Cemîla Wezîr a 85 salî behsa serpêhatiyekê xwe li gel Nemir Mele Mistefa Barzanî dike.

Di cîhanê de yek ji warên Kurdan jî Kafkasya ye. Hejmareke mezîna ya Kurdên ku li Kafkasyayê belavbûyî li Bakuyê dijîn. Yek ji wan jî rojnameger û nivîskar Tahir Silêman e ku rojnameyêke bi navê Diplomat amade dike. Ev rojnameya heftane, zêdetir behsa pêşhatên derbarê Kurdan de dike. Ji ber derfetên kêma aboriyê Tahir Silêman rojnameyê li mala xwe amade dike.

Nivîskar û rojnameger Tahir Silêman ji K24ê re dibêje: "Ev 21 sal in ez vê rojnameyê çap dikim. Em vê rojnameyê bi kurdî, tirkî, ezerî û rûsî çap dikin û bi her çar zimanan dişînin Kurdistanê. Heta pandemiyê jî me bazirganî dikir, rewşa me baş bû lê belê niha rewşa me ya abûrî ne gelek baş e. Min beşeke mala xwe kiriye cihê amadekirina rojnameyê. Ez tenê vê rojnameyê amade dikim, ti kes alîkariya min nake."

Di salên 1950an de Nemir Mele Mistefa Barzanî bo demekê li Kafkasyayê dimîne. Cemîla Wezîr a wê demê 12 salî dibêje; wê Nemir Mele Mistefa li Taşkentê ditiye û bi hestiyarî behsa serpêhatiyekê xwe dike û tîne zimên; hesreta wê ew e ku di 85 saliya temenê xwe de serdana

Herêma Kurdistanê bike.

Cemîla Wezîr dibêje: "Demekê min dît derî vebû û kesek hate hundir, hemû kesên li hundir rabûn ser piyan. Min ji mamê xwe pirsra wî kir; mamê min got; ev Mele Mistefa



Barzanî ye, general e. Ez gelek keyfxweş bûme ku min Mele Mistefa Barzanî ditiye ku wî temenê xwe di oxira Kurdan de daye. Ez gelek serbilind im ku li kêleka wî rûniştim û min ligel axaftiyê. Rehma Xwedê lê be. Zarokên wî jî li wî çûne. Ez dixwazim Kurdistanê bibinim. Şabûna miletê xwe bibinim. Ez bibînim ku li Kurdistanê Iraqê hikûmeta Kurdistanê heye, mezinên me hene. Şikir ku kûrê Barzanî ye, babê wî miroveke gelek baş bû."

Hejmara Kurdên li Azerbaycanê nayê zanîn, lê belê tê gotin ku hejmara wan bi sedhezaran e. Ji ber bişaftin û sedemên cûrbecûr di nava

piraniya Kurdên Azerbaycanê de kurdî hatibe jibîrkirin jî malbatên ku hewla parastina çand û zimanê xwe didin jî hene.

Xalidê Evdilbarî got: "Em eslê xwe ji Wanê hatine, lê belê bab û kalên

me ji Dohukê hatine. Ji beriya 200-300 salan i Duhokê derbasî Îranê bûne û ji Îranê derbasî Tirkîyeyê bûne û jê em derbasî Ermenîstanê bûne. Ev 80 sal in jî em hatine Azerbaycanê."

Marîna Îsayev jî dibêje: "Ez dikarim bi zimên kurdî, îngîlîzî, rûsî, farsî, azerî û tirkî biaxivim. Em li vir bextewar in lê me dixwest ku em Kurdistanê jî bibinim." Kurdên Bakuyê di şîr û şahî angû de rojên xweş û nexweş de jî tîne cem hevdu û hewl didin ku çanda xwe, zimanê xwe biparêzin lê belê hesreta dilê gelek ji wan ew e ku Herêma Kurdistanê jî bibinim."

**Nerina Azad**

## Serok Barzanî Serê Sala nû ya Koçî pîroz kir

Serok Mesûd Barzanî îro 19ê Tîrmeha 2023an peyameke pîrozbayê bi boneya hatina



Serê Sala nû ya Koçî belav kir.

Peyama Serok Barzanî:

"Bi navê Xwedayê mezin û dilovan Bi boneya hatina sersala 1445an a koçî, germtirîn pîrozbahiyên xwe arasteyî Misilmanên Kurdistanê û hemû cîhanê dikim.

Di Serê Sala Nû ya Koçî de, hêviya xêr û xweşiyê ji her kesî aliyekî re dixwazim.

**Mesûd Barzanî**

**1 Muhherema 1445 koçî, 19 Tîrmeha 2023an"**

## Umêd Sebah: Divê Bexda budceya Herêma Kurdistanê bişîne

Serokê Dîwana Encûmena Wezîran a Herêma Kurdistanê Umêd Sebah ragihand, Hikûmeta Herêma Kurdistanê hemû



pabendiyên xwe li hember Hikûmeta Federal a Iraqê cîbicî kirine û divê Bexda budceya Herêma Kurdistanê bişîne.

Serokê Dîwana Encûmena Wezîran a Herêma Kurdistanê Omêd Sebah ragihand, Hikûmeta Herêma Kurdistanê hemû pabendiyên xwe li hember Hikûmeta Federal a Iraqê cîbicî kirine û divê Hikûmeta Federal ji 26ê Hezîranê ve hemû heqên Herêmê bişîne û ti hinecetek jî ji bo neşandina budce û mûçeya Herêma Kurdistanê nemaye.

Îro Pêncşemê 20ê Tîrmeha 2023an, Serokê Dîwana Encûmena Wezîran a Herêma Kurdistanê Omêd Sebah di konferanseke rojnamevaniyê de ku li Bexdayê birêve çû, karên çend rojên borî yê civînên şanda Hikûmeta Herêma Kurdistanê yê li ser mijara cîbicîkirina yasaya budce û mijara petrolê ligel Hikûmeta Federal eşkere kir û ragihand, Hikûmeta Herêma Kurdistanê hemû amadebûna xwe nîşan daye ku her pabendiyek bikeve ser wê, pêk bîne.

Omêd Sebah diyar kir, di yasaya budceyê de hatiye ku Herêma Kurdistanê pabendî dikeve ser wê, herwiha got ku ji 25ê Hezîranê ve Herêma Kurdistanê rojane bi qasî 50 heta 60 hezar bermîl petrol radestî Hikûmeta Federal kirine, ku ew mîqdar ji aliyê Hikûmeta Federal ve hatiye diyarkirin û rêjeya wê jî tê bilindkirin heta ku budce dikeve warê cîbicîkirinê.

Sebah eşkere kir, ti hinecetek tune ye ku pere bo Herêma Kurdistanê neyê şandin û got, ji bo îsbatkirina şefafiyeta Hikûmeta Herêma Kurdistanê daxwaz ji çavdêriya darayî ya Iraqê kiriye ku heftêya bê, dest bi hûrbîniyê bikin weke ku di yasaya budceyê de hatiye. Serokê Dîwana Encûmena Wezîran a Herêma Kurdistanê eşkere kir, divê îsal ji 26ê Hezîranê ve, hemû heqên Herêma Kurdistanê bi hev re werin dayîn, angû ne tenê şandina mûçeyan, herwiha derbarê şeş mehên borî de jî ku budce jê re werin hesabkirin di nava mehekê de bo Herêma Kurdistanê werin şandin.

**Nerina Azad**



## Serok Barzanî û Wezîrê Hêzên Çekdar ên Fransa civiyan

Serok Mesûd Barzanî îro 20ê Tîrmeha 2023an pêşwazî li Wezîrê Hêzên Çekdar ên Fransa Sebastien Lucornois û şanda pê re kir.



Serok Mesûd Barzanî îro 20ê Tîrmeha 2023an pêşwazî li Wezîrê Hêzên Çekdar ên Fransa Sebastien Lucornois û şanda pê re kir.

Di hevdîtîne de rewşa siyasî ya cîhanê, navçe û Iraqê hate gotûbêjirin û ji bilî balkişanda li ser dostaniya dîrokî ya gelê Kurd û gelê Fransa, tekezî li ser pêşxistina dostanî, pêwendî û hevahengiya di navbera her du aliyên de hate kirin. Her di vê hevdîtîne de, derbarê gefên DAIŞê û hizra tundrewî yê li ser Iraq û navçeyê de, gotûbêj hatin kirin. **Nerina Azad**

## Parêzerê Kurd ji bo zimanê Kurdî dê ji Stenbolê heta Enqerê bimeşe

Parêzerê Kurd Subhî Ozgen ragihand, ji bo mafê perwerdehiya bi zimanê Kurdî, ew ê ji Stenbolê heta Enqerê bimeşe.



Parêzerê Kurd Subhî Ozgen ragihand, ji bo mafê perwerdehiya bi zimanê Kurdî, ew ê ji Stenbolê heta Enqerê bimeşe.

Subhî Ozgen li ser hesabê xwe yê tora medyaya civakî ya Twitterê peyameke vîdyoyî belav kir.

Ozgen ragihand: "Ji bo balê bikşînim ser daxwazên mafên zimanê Kurdî, ez ê di 24ê Tîrmehê de dest bi meşa ji Stenbolê heta Enqerê bikim."

Parêzerê Kurd Subhî Ozgen diyar kir: "Ji bo alîkarî û piştgiriyê hûn jî vexwendî ne." **Nerina Azad**

## Metran Şemûn Danyal: Dezgehên ewlehiyê yê Kurdîstanê ji bo çareserkirina kêşeyan her dem alîkar bûne



Metranê Dêra Rojhilat serdana Akre û deverên ku Krîstiyân tê de niştecî ne, kir û di daxuyaniyêke rojnamevanî de ragihand, ew spasiya dezgehên ewlehiyê yê Hikûmeta Herêma Kurdîstanê dikin ji ber alîkariya wan a berdewam a ligel wan û bersivdana ji bo hemû pirsên ku li wê navçeyê rûdîdin.

Roja Pêncşemê 20ê Tîrmeha 2023an, Metranê Dêra Rojhilat Metran Şemûn Danyal ragihand: "Em spasiya dezgehên ewlehiyê yê Hikûmeta Herêma Kurdîstanê dikin ji ber alîkariya wan a berdewam a ligel wan û bersivdana ji bo hemû pirsên ku li wê navçeyê rûdîdin. Herwiha em spasiya hewlên Serok Mesûd Barzanî dikin, ku her dem hembêza wî ji bo Krîstiyanan vekirî ye û piştewaniya wan dike."

Metran Şemûn Danyal diyar kir: "Em spasiya Serokwezîrê Herêma Kurdîstanê Mesrûr Barzanî, herwiha Mensûr Barzanî û Wezîrê Navxwe yê Herêma Rêber Ehmed dikin, ku her dem ji bo ghiştina hawara Krîstiyanan li Herêma Kurdîstanê amade ne û di egera rûdana kêşeyekê de rasterast tene ser xet û kêşeyan çareser dikin." Li ser rewşa Krîstiyanan li navçeyê, Metranê Dêra Rojhilat diyar kir: "Spas bo Xweda li vê derê bextewarî heye û hevkarî û xoşewîstiya berdewam heye." **Nerina Azad**

## Neçîrvan Barzanî: Ji bo yekbûna Pêşmerge wê xebat dewam bikin

Serokê Herêma Kurdîstanê Neçîrvan Barzanî fermanî gîştî yê hêzên koalîsyona navdewletî yê ji Iraqê û Sûriyê berpîrs general General Matthew McFarlane û heyeta pêre qebûl kir.

Her dû teref li ser pêvajoya reformên di wezareta Pêşmerge de, yekkirina hêzên Pêşmerge, rêxistina wan, astengiyên li pêşiya wan û li ser çareseriyê pîrsgirêkan axifîn. Hat ragihandin ku reformên divê bi wezareta Pêşmerge de dimeşin, ne li gor bernamê dimeşin û behsa pîrsgirêkan kirin.

Neçîrvan Barzanî got ku tevî hemû astengiyên wê hewl bidin ku pêvajoya reformê biser bixin. Barzanî ji ber hewlên xebat û



teşwîqên Amerîkayê sipasiya wan kir.

Di hevdîtîne de balyozê Amerîkayê yê Hewlêrê Irvin Hicks jî

amade bû û her dû teref li ser pêwendiyên Hewlêr-Bexda, rewşa herêmê û mijarên ku her dû terefan eleqedar dikirin axifîn. **PeyamaKurd**

## 93 sal derbas bûn, lê Kurd qet Simkoyê Şikak ji bîr nakin

93 sal beriya niha Simayîl Axayê Şikak ku weke "Simkoyê Şikak" an jî "Simîtko" tê nasîn, li bajarê Şinoyê yê Rojhilatê Kurdîstanê bi biryara şahê wê demê yê Îranê Rîza Şah ve ji aliyê leşkerên wî welatî ve hat şehîdkirin. Lê bandora serhildana wî rêberê Kurd hê jî li Rojhilatê Kurdîstanê û bi taybet li herêma Urmiyê maye. Simayîl Axayê Şikakî di sala 1887ê li Urmiyê ya Rojhilatê Kurdîstanê ji dayik bûye. Kurê Mihemed Axayê serokê eşîra Şikak e. Piştî birayê wî Cewer Axa bi destê rejîma Îranê ya wê demê li bajarê Tewrêzê hat kuştin, Simko serokatiya eşîra Şikak wergirt.

Piştî ku sala 1905an, Cewer Axayê Şikak ku birayê Simko bû, li Tewrêzê hat kuştin, Simko soz da ku tola wî hilde û şerê li dijî hikûmeta wê demê ya Îranê berdewam bike.

Li gor gelek çavkaniyên biyanî û Kurdîstanî, tevî ku di destpêkê de hestê tolhildanê li cem Simko hebûye, lê belê piştî derbasbûna demekê hizra wî ber bi tevgereke netewî ve çûye. Li gor wan çavkaniyan, şerê Simkoyê Şikak bi hikûmeta Îranê re şerekî netewî û ji bo bidestxistina mafên neteweyî yê milletê Kurd bûye.

Girîngiya serhildana Simkoyê Şikak ku nêzî 25 salan dom kir, ew e ku piştî şerê cîhanê yê yekem nêzî %50 ji axa Rojhilatê Kurdîstanê ji destê desthilatdariya dewleta Îranê derxist û xiste bin kontrola xwe û rêveberiyek taybet ava kir. Herwiha piştî şoreşa Şêx Ubeydullahê Nehrî û Kela Dimdim, sores û serhildana Simkoyê Şikak, tevgera herî mezin a Kurdî li Rojhilatê Kurdîstanê bû. Hêza serbazî ya Simkoyê Şikak pîranî ji çekdarên eşîreta Şikak pêk dihat, lê belê piştî ku eşîretên din ên Rojhilatê Kurdîstanê piştgirî dan wî, wan eşîran jî çekdarên xwe tevî hêza Simko û Şikakan kirin.

Şikak li Rojhilatê Kurdîstanê piştî eşîreta Kelhûr li herêma Kirmaşanê mezintirîn eşîreta vê perçeyê Kurdîstanê ye ku di serdema desthilatdariya Qacarî û Pehlewîyan de li Îranê û Kurdîstanê xwedî rolekî aktîv ê siyasî bûn. Navenda desthilatdarî û hêza Simkoyê Şikak û eşîreta Şikak bi gîştî Kela Çariyê li navçeya Selmasê û herwiha bajarê Urmiyê bû.

Di dema herî bihêziya xwe de,

her ji Mako û Kela Xwê (Xoy), Selmas, Urmiyê, Mihabad, Şino û bajarokên din ên parêzgeha Urmiyê heta sînorê Seqiz, Bane û Merîwanê

dine, gelek bi aşkere behsa mafên netewî yê Kurdan, welatek bi navê Kurdîstanê û serxwebûna Kurdîstanê kiriyê.



li parêzgeha Sine di jêr desthilatdariya wî de bû û gefa kontrolkirina Sine û Kirmaşanê jî dixwar.

Rojnameya navdar a Amerîkî ya New York Times di raporekê xwe ya sala 1922ê de behsa şoreşa Simkoyê Şikak dike û dibêje, hikûmeta Kurdîstanê hatiye damezrandin. Di raporê de tê gotin, ku Simko serkirdatiya hêzeke çekdar a 85000 kesî dike û sînorê hikûmeta wî jî Urmiyê, Selmas, Kirmanşan û Erdelan e. New York Times herwiha dibêje, çavê Simko li Loristanê ye jî. Simkoyê Şikak di serdemekê de ku hêj civaka Îranê bi gîştî û ya Rojhilatê Kurdîstanê paşketî û feodalî bû û li ser bingeha rejîma axatiyê birêve diçû, gelek karên giring kirin, weke mînak li Kela Xwê bi alîkariya malbata Bedirxaniyan Medreseya Cîhanbanî vekir û di wê medreseyê de ji bilî fêrkirina zanistê bi zimanê Kurdî û Farsî, bi pereyê hikûmeta xwe xwandekarên Kurd fêrî zimanên Fransî, Rûsî û Tirkî dihatin kirin. Herwiha yekemîn rojnameya Kurdî li Îranê û Rojhilatê Kurdîstanê bi navê "Kurdistan" di serdema desthilatdariya Simko de li bajarê Urmiyê hatiye çapkirin û weşandin. Simko herwiha di navbera bajar û cihên stratejîk ên di bin desthilatdariya xwe de, cihên weke Mihabad, Urmiyê, Selmas û Kela Çariyê xeta telegrafê kişand.

Weke ku nivîskar û dfirokzanê Fransî, Chris Kutschera dibêje, Simko di çend nameyên xwe de ku bo çend berpîrsên Rûsî, Brîtanî şan-

Kutschera herwiha ji ber xebatên wî yê di serdema xwe de, Simkoyê Şikak weke "bavê nasyonalîzma Kurdî" li Rojhilatê Kurdîstanê bi nav dîke.

Simko di beşeke nameya xwe de ku ji bo fermanî hêzên Îranê li bajarê Meraxê Zefer el Dulê şandiye, dibêje: "Em pîr baş dizanin ku hinek netewe di cîhanê de hene ku hejmara wan nagihê çaryeka kurdan, lê ew ghiştine xweziyên xwe ku mafê otonomiyê ye. Li almanan binêrin ku çawa ev karê han di nava xwe de pêk anîne. Bi rastî ger netewa kurd di Îranê de negihije mafê xwe, êdî mirin û neman jê re baştîre ji jîyan û mayîne. Di vê roja ku em tede dijîn, dewleta Îranê bixwaze an jî nexwaze, em mafê xwe yê otonomiyê dixwazin. Êdî ev xweziya hemû mirovekî Kurd e û ji xelkê me re jî jiyaneke nû ye.

Ev name dide diyarkirin ku Simko mirovekî dûrbîn bûye û ji bo standina mafê rewa yê gelê Kurd bi armancên mezin û planên nû dest bi xebata xwe ya siyasî kiriye.

Simkoyê Şikak di 25 salên serhildana xwe de, rastî gelek serkevtin û şikestan jî hat, herî dawî piştî ku hikûmeta Îranê karî serhildana wî tîk bibe, Simko derbasî aliyê Başûrê Kurdîstanê bûbû û piştî demekê li ser banga Îranê ya ji bo muzakere û danûstandinan, di 21ê Tîrmeha 1930an de çûbû Şinoyê û li wir bi pîlana Rîza Şah ji aliyê hêzên Îranê ve hat şehîdkirin. **Nerina Azad**



## Nêçîrvan Barzanî û Îlham Aliyev tekeziyê li ser pêşxistina pêwendiyên dikin



Serokê Herêma Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî û Serokê Azerbaycanê Îlham Aliyev tekezî li ser pêşxistina peywendiyên dikin.

Li gorî malpera Serokatîya Herêma Kurdistanê, "Piştî ku îro 18ê Tîrmeha 2023an bi serdaneke fermî gihîşt bajarê Baku Paytexta Azerbaycanê, Serokê Herêma Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî bi germî ji aliyê Serokomarê Azer-

baycanê İlham Aliyev ve li Koşka Komarî pêwazî lê hate kirin."

Diyar kir jî, "Di civîneke dostane de her du aliyên tekez li ser pêşxistina pêwendiyên di navbera Azerbaycan û Iraq û Herêma Kurdistanê di hemû waran de hate kirin, bi taybetî di warên aborî, bazirganî, geştîyarî û enerjîyê de û derfetên veberhênanê ji bo kompaniyayên Azerbaycanê li Herêma

Kurdistanê û Iraqê hate gotûbêj kirin."

Her wiha tekezî li ser giringiya vekirina Konsulxaneya Giştî ya Azerbaycanê li Herêma Kurdistanê hate kirin, ku berî niha biryar hatiye dayîn û behsa rêkaran hatibû kirin, ji bo di demeke nêzîk de bê vekirin û kar ji bo pêşxistina pêwendiyên û hevkarîkirina her du aliyên bike.

Her wiha di civînê de, dawîna rêkar û pêngavên geştên asmanî yên di navbera Hewlêr û Baku de û Baku li gel Bexda û çend navçeyên din ên Iraqê, hêskirina dayîna vîze û pevguherîna serdan û şandên her du aliyên hatin gotûbêj kirin. Piştî di civîneke din de ku bi amadebûna şandên her du aliyên û beşdariya Berpirsê Karûbarên Balyozxaneya Iraqê li Bakuyê hat lidarxistin. Kanalên pêwendiyê û rêkarên şopandina mijarên hevdîtina her du serokan ji bo pêşxistina pêwendiyên hatin gotûbêj kirin û biryarên pêwîst hatin standin. **rupelanu.com**

## Nêçîrvan Barzanî û Îlham Aliyev civiyan



Serokê Herêma Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî û Serokomarê Azerbaycanê İlham Alivey, di çarçoveya dan û stendinên dîplomatk de li Bakuyê civiyan.

Di agahiyên ku li ser serdana Nêçîrvan Barzanî hatin ragihandin de hat diyarkirin ku Serokê Herêma Kurdistanê, li Balafirgeha Bakuyê ji aliyê rayedarên Dewleta Azerbaycanê ve hat pêşwazî kirin.

Li gorî hat zanîn, Nêçîrvan Barzanî piştî bi İlham Aliyev re civiya û li ser pêwendiyên dualî nirxandin hatin kirin.

Di hevdîtina ku qala pêwendiyên di navbera Azerbaycan, Iraq û Herêma Kurdistanê de hat kirin de li ser bipêşxistina pêwendiyên û pêkvejiyana di warên cuda de tekezî kirin. Beriya niha jî di sibata borî de Nêçîrvan Barzanî tevî di Konferansa Ewlekariya Munchenê bûbû û di wê konferansê de jî ligel Aliyev civînek kiribû. **PeyamaKurd**

## Li Lozanê xwepêşandeke berfireh li dijî Peymana Lozanê tê saz kirin

Li bajarê Lozanê yê Swîsrayê xwepêşandeke berfireh bi boneya derbasbûna 100 salan bi ser Pey-



mana Lozanê re tê saz kirin û Kurdistanîyên ji bajarên cuda tê de beşdar in. Li bajarê Lozanê yê Swîsreyê di 100 sala Peymana Lozanê de ku 24ê Tîrmeha 1923an hatibû îmzekirin û nehiştibû Kurd bibin xwedî statu, nêzîkî 15 hezar Kurd li dijî peymanê xwepêşandane dikin û biryar e heta sibe berdewam be.

Ji serê sibê ve ji gelek welatên Ewropayê Kurdistanîyên ji bajarên cuda berê xwe dan bajarê Lozanê. Meşa xwepêşanderan ji pêşiya avahiya Chateau d'Ouchyê ku hevdîtinên Lozanê lê hatin kirin dest pê kir û ber bi Qesra Rumine ya ku peyman lê hatibû îmzekirin, berdewam kir.

Peymana Lozanê 24ê Tîrmeha 1923an li bajarê Lozanê yê Swîsreyê ji aliyê welatên weke Brîtanya, Fransa, Tirkiye, Yûnanistan, Japan, Romanya, Kirwatya, Slovenya û Sirbistanê ve hatiye îmzekirin.

Peymana Lozanê ku yek ji peymanên dîrokî ye, ji ber berjewendiyên çend dewlet û hêzên cihanê li gorî wê peymanê erdnigariya Kurdistan di navbera Tirkiye, Îran, Sûriye û Iraqê de hat perçekirin.

Ji ber ku Peymana Lozanê hat îmzekirin û kete meriyetê, Peymana Sêvrê ku avabûna dewleta Kurdistanê dihate pêşbînîkirin, derbasdariya xwe ji dest da.

Damezrandina Kurdistanê û sînorên wê di xalên 62, 63 û 64an de, ku di beşa sêyem a peymanê Sevrê ya ku di sala 1920an de hat îmzekirin, bi zelaî bi navê Kurdistanê hatibû behskirin. **Rûdaw**

## Hikûmeta Kurdistanê dê nûneratiyên xwe yê nû li welatan veke

Hikûmeta Kurdistanê berdewam e li ser berfirekiriya peywendiyên xwe ligel welatan û niha Ofîsa Pey-



wendiyên Derve ya Hikûmeta Herêma Kurdistanê kar li ser vekirina nûneratiyên nû li welatan dike û biryar e li Herêma Kurdistanê ji wan Qeter û Azerbaycanê jî kon-

sulxaneyên nû xwe vekin. Berpirsê Fermangeha Peywendiyên Derve ya Hikûmeta Herêma Kurdistanê Safîn Dizeyî ji malpera fermî ya Partiya Demokrata Kurdistanê (PDK) re ragihand: "Em weke Hikûmeta Herêma Kurdistanê 14 nûneratiyên me li welatên cuda hene û em dixwazin û kar li ser wê yekê dikin ku nûneratiya xwe li hin welatên din vekin, ku armanç berfirekiriya peywendiyên Herêma Kurdistanê ligel welatên din e."

Dizeyî wiha got: "Diyar bû ku Serokê Herêma Kurdistanê li Azerbaycanê bi germî hat pêşwazî kirin û ew dê konsulxaneya xwe li Herêma Kurdistanê vekin û Qeter jî dê di demê nêzîk de konsulxaneya xwe li Herêma Kurdistanê veke, lewra ev jî nîşaneke baş e ku Herêma Kurdistanê xwedî pêgeheke bihêz e."

Niha li Herêma Kurdistanê 40 konsulxane û nûneratiyên welatan hene, ji wan 38 welatên endam di Netewên Yekbûyî de ne. **KDP.info**

## Rêbiwar Talebanî: 'Heta rewşa Kerkûkê asayî nebe, divê ti hilbijartin neyê naskirin'

Şewirmendê Serokwezîrê Herêma Kurdistanê yê ji bo Karûbarên Navçeyên Kurdistanê Rêbiwar Talebanî ku beriya bûyerên 16ê Cotmeha 2017an parêzgarê Kerkûkê bû derbarê hilbijartinên encûmena parêzgeha Kerkûkê de daxuyanî da.

Talebanî got, heger Kurd her 16 kursiyên Encûmena Parêzgeha Kerkûkê bidest bixin jî, ti bihayeke wê nîne û guhertin çênabe û di dewamê de diyar kir: "Heta rewşa Kerkûkê asayî nebe, ti hilbijartineke ku li Kerkûkê bê kirin, divê neyê naskirin."

Rêbiwar Talebanî, li ser hilbijartinên encûmenên parêzgehên Iraqê ku roja 18ê Kanûna 2023yan tene lidarxistin, ji ber lihevnekirina aliyên Kurdistanê li ser Hevpeymaniyê Kurdistanê rexne kir û wiha axivî:

"Piştî bûyerên 16ê Cotmeha 2017an û piştî 5 salan, tenê çend meh ji hilbijartinên encûmenên parêzgehan re mane, partiyên Kurdî nû li hev dicivin û dibêjin 'yek lîste baş e'. Lê mixabin ez nizanim çima Kurd ti plan û stratejiyê wan tune ye, ev hemû kêmasî ye."

Talebanî ji K24ê re gotiye, ew di wê baweriyê de ye ku aliyên siyasî yê Iraqî hewl didin "nasnameya Kurdî ya Kerkûkê jinav bibin" di dema ku partiyên Kurdî hêj nû doza yekrêzî û yeklîsteyê dikin û wiha pê de çû: "Yekîti her tim baş e, Kurd her dema bûne yek, her tim gihîştine mafên xwe. Her dema ku haya wan ji xwe tune bûye, tî xapandin û destkeftiyên wan ji destê wan tî standin."

Talebanî li ser rewşa Kerkûkê dide zanîn: "Projeya hilbijartinê, pêwîstiya wê bi rewşeke asayî û azadiyê heye, niha her du jî li Kerkûkê tune ne, li şûna wê artêş

û milîs li bajêr hene, ji bilî wê yekê jî, madeya 140 a destûra Iraqê nehatiye bicihkirin... Hilbijartinên encûmenên parêzgehên Iraqê yan jî her hilbijartineke din li Kerkûkê, bêtî asayîkirina rewşa Kerkûkê bê kirin, nabe bê naskirin."



Şewirmendê Serokwezîrê Herêma Kurdistanê diyar dike: "Eger rewşa Kerkûkê vegere rewşa asayî û hilbijartin bînin kirin, wê demê hilbijartin dê girîng be û paşeroj û nasnameya Kurdî li Kerkûkê diyar bike."

Hêjayî bibîrxistinê ye, hilbijartina dawî ya Encûmenên Parêzgeha Kerkûkê di sala 2005an de hatibû kirin, partiyên Kurdî bi yek lîsteyê "Lîsteya Birayetî" beşdarî hilbijartinan bûn û ji koma 41 kursiyên, 26 kursî bidest xistibûn. Partiyên Tirkmen 9 kursî û Erban jî 6 kursî bi dest xistibûn. Niha hejmara kursiyên ji 41an daketiye 16 kursiyên. **PeyamaKurd**



# Serpêhatiya rêberê efsaneyî Simkoyê Şikak



çarçoveyê de dibistaneke kurdî li bajarê Xoyê (bajarê Xwê) tê vekirin ku çend mamosteyên Kurd ku ji Qefqazê hatibûn, bi zimanê Kurdî û Rûsî, ders dane 29-30 zarokên Kurd.

Li dawiya sala 1914an di kelekela şerê yekem ê cîhanî de, li gor lihevkirina di navbera Rûs û Îraniyan de, di dema dîrxistina Simko ji aliyê Rûsan ve bo Tiflîsê, li nêzî Colfayê ji aliyê Ermeniyan ve teqe lê hate kirin, lê ti zirarek negihîştê.

